Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1322 | 5-Mijdar-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# 5’emîn Mihrîcana Fîlman a Navneteweyî ya Rojava tê amadekirin

Esma Miştefa/Qamişlo

**5’emîn Mihrîcana Fîlman a Navneteweyî ya Rojava wê bi dirûşmeya “Çîrokên Hevpar, Sînemaya Azad” ji 13 heyanî 20’ê Mijdarê li bajarê Qamişlo bê lidarketin. Endama Komîna Fîlm a Rojava Nûpelda Herekol wiha got: “Heyanî niha 60 fîlm ji Kurdistan û cîhanê hatine pejirandin.”**



Asta sînemageriya Kurdî bi demê re her ku diçe pêş dikeve û di çarçoveyeke berfireh de lêgerîn, xebat û berhem tên berhevkirin. Mihrîcana Fîlman li Rojavayê Kurdistanê ji sala 2016’an ve tê lidarxistin, lê bi herikîna pêvaşo û rewşên ku di herêmê de rûdane, hin salan mercên lidarxistina festîvalê peyda nebûn. Îsal 2025, wê 5’emîn Mihrîcana Fîlman a Navnetewî ya Rojava bi hêz û berhemên nû derkeve pêşberî gelê Kurd û yên cîhanê.

Dê mihrîcan di 13’ê Mijdara 2025’an de li bajarê Qamişlo a herêma Cizîrê bi dirûşmeya “Çîrokên Hevpar, Sînemaya Azad” were lidarxistin. Têkildarî amedekarî û naveroka mihrîcanê endama Komîna Fîlm a Rojava Nûpelda Herekol ji Rojnameya me re axivî.

### ‘Li gor şert û mercên herêmê, di hin salan de mihrîcan pêk nehat’

Nûpelda di destpêka axaftina xwe de hinek behsa salên borî yên mirhrîcanê kir û wiha anî ziman: “Ev xebat ji sala 2016’an ve tê birêvebirin di wan her du salan de festîval hatin çêkirin, lê piştî sala 2018’an di hin salan de festîval nehatin lidarxistin. Ev yek jî ji ber rewşa herêmê a ku di aliyê şer û leşkerî ve dihate jiyankirin, ji lewra şert û mercên organîzekirina festîvalê nebûn. Yek ji perensîpên ku festîval li ser hatiye avakirin ku her sal bi naverok û berhemên têr û tijî derkeve pêşberî gel. Lê piştî ku şert û mercên herêmê di aliyê ewlekarî û hwd de hinek istiqrar bû niha em gihîştin 5’emîn Mihrîcana Fîlman a Navnetewî ya Rojava”.




### Wê berhem ji Rojava, Kuridstan û cîhanê bên pêşkêşkirin

Nûpelda di berdewamiya axaftina xwe de bal kişand ser 5’emîn Mihrîcana Fîlman a Navnetewî ya Rojava û wiha bilêv kir: “Îsal em ê bi dirûşmeya “Çîroka Hevpar, Sînemaya Azad” wê bê lidarxistin. Her wiha wê mihrîcan li du navendan pêk were; Yek li navenda Mihemed Şêxo a Çand û huner, ya din jî wê li Navenda Tev-çand a Mezopotamiya ji dîroka 13’ê Mijdarê heyanî 20’ê Mijdarê bidome.

Naverok wê fîlmên ku li Rojava hatine çêkirin û her wiha yên cîhanê û her aliyên Kurdistanê, wê bigre nava xwe. Ji dema me amedekarî destpêkirine û heyanî niha nêzî 200 fîlmî gihîştin destê me, ji derveyî welat û hundir welat. Ya ku herî zêde me kêfxweş kiriye ku îsal ji perçeyên Kurdistanê berhemên gelek xweş û zêde gihîştine me. Her wiha wê mêvanên me ji sê perçeyên Kurdistanê jî bi me re beşdar bin ev jî cihê serbilindiyê ye ku Rojava bibe cihê kombûna derhêner, sînemager û lîstikvanên Kurd. Derveyî fîlman wê belgefîlm û sînaryoyên ku hatine nivîsandin jî li gorî bernameyê bên pêşkêşkirin. Fîlmên Metrajdirêj, kurtefêlm, belgefîlm û sînaryo wê naveroka festîvalê de cih bigrin. Bêguman wê ji her çar beşan re jî xelatên wan werin dayîn. Bi giştî organîzasyoneke bi vî rengî hatiye amedekirin”.

### Bingehên ku li ser wan fîlm hatine pejirandin

Nûpelda di dirêjahiya axaftina xwe de naveroka fîlmên ku hatine esasgirtin anî ziman û got: “Helbet naveroka wan fîlman jî zêdetir wê fîlmên çîrokên jinan, çîrokên zarokan, çîrok û serpêhatiyên gelên bindest, gelên ku ji dagirkeriyan êş dikşînin û hebûna xwe dixwazin îspat bikin. bi gelemperî fîlmên bi navarokên azadiya gelan û şoreşan hatin esas girtin û qebûlkirin, heyanê niha jî nêzî 60 fîlmî hatiye pejirandin”.

Nûpelda di axaftina xwe de hinek rastiya sînemageriya Kurd eşkere kir û wiha pê de çû: “Helbet di Rojavayê Kurdistanê de avakirina xebatên Sînemageriyê yek ji gavên herî bi nirx e, ji ber ku taybetmendiya Rojava cuda ye, him berxwedanî heye him jî jiyana gel heye. Helbet ew jiyan gelek zehmet tê herikîn, ji ber rastiya Rojava ya ku her di nava gef û êrişên dijmin de jiyankirin, heye. Ji lewra em wek Komîna Fîlm a Rojava me her tim bi derfetên heyî, em çîrok, serpêhatî, berxwedanî û destanên ku hatine jiyankirin, nemir bikin. Li ser vê bingehê xebatên me hatin kirin, taybet di van salên dawiyê de 3’ê fîlmên me hatin çêkirin, yek ji wan Heval Birako ya ku ji berhema Şehîd Nazim Deştan e ku bi wê berhemê wê festîval bê vekirin.

Di heman demê de ji bo gelê Kurd û Kurdistanê fîlmên Kurdî ango sînemageriya Kurdî bi têkoşîneke pir bi heybet pêş ket, ji derhênerê nemir Yilmaz Guney bigre heyanî têkoşerê mezin Şehîd Xelîl Dag û heya roja îro ku gelek hevalên me di vê rêyê de şehîd bûne. Ji bo me berdewamkirina rêya wan nemiran gelek bi qedir û qîmet e ku em hewil didin bi van berhem û xebatê xwedî li wan derkevin”.

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER BÊTIRSIYÊ**

**Ber de çû/di ber de çû/di ber re çû:**
- Hesab jê re nekir; mezinayiya wî qebûl nekir; jê netirsiya.

**Bibe baran erdê şil nake:**
- Ne ew kes e ku bikare zererê bide; ez jê natirsim.

**Cotkar ji çûkan bitirsiya, garis li zeviyê nedireşand:**
- Ez natirsim; reş û gefxwarin bandorê li min nakin.

**Çavtarî ye:**
- Bê ku bihizire tev digere; ji tiştekî natirse.

**Çengên xwe hejandin û borî:**
- Pakî ji ti kesî nekir; ji ti kesî netirsiya.

**Golikê malê ji gayê malê natirse:**
- Yên nêzîkî hev, yên hev nas dikin, yên bi he re dijîn pakiyê ji hev nakin.

**Gur di xema baranê de be wê ji xwe re çoxekî çêke:**
- Ez natirsim; ez pakiyê ji ti kesî nakim.

**Gur ji berf û bagerê bitirsiya wê kurkek ji xwe re çêkira:**
- Bi heman wateyê.

**Gur pakî ji berfê bikira, wê kurkek ji xwe re peyda bikira:**
- Bi heman wateyê.

**Gurçikpola ye:**
- Bêtirs e.

**Ji banger mezintir bi ser çûkê de nayê:**
- Tişta hatî serê me ji wê mezintir nayê serê me; hema çi dibe bila bibe; em natirsin.

**Kefenê me di bin milê me de ye:**
- Em ji her tiştî re amade ne; mirin jî tê de, alîkariya ji me bê xwestin emê bikin.

**Kefenê xwe li serê xwe pêçaye:**
- Bêtirs e; bêfikar e; ka wê çi were serê wî ne li xema wî ye.

**Kesê bikeve gola avê ji baranê natirse:**
- Kesê kêşeyên wî yên mezin hebin ji yên piçûk natirse.

**Kesê ji guran bitirse pez xwedî nake:**
- Dema behsa xeterê ji yekî re tê kirin yan gef lê tên xwarin hingê dibêje.

**Mala me çovê me ye çovê me li ser milê me ye:**
- Pirsgirêkên me nînin; tiştekî ku em jê bitirsin nîne.

**Mast sed carî mast:**
- Ez natirsim; ezê rastiyê bêjim hema çi dibe bila bibe.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Ayşa Silêman



## Zêdebûneke bifikar a kuştina jinan li Îranê

Li Îran û Rojhilatê Kurdistanê kuştina jinan di bin hincetên cuda de hatiye rewakirin, êdî nefreta li dijî jinê normalîze bûye, lewma di salên dawî de zêdebûneke bi fikar di sûcên kuştina jinan de çêdibe.**R-2**




## Diyalogên di navbera Îmralî û Tirkiyê de...(1)

Bi banga dîrokî ya Rêber Apo ku di 27’ê Sibatê de kiribû dengvedanek li Rojhilata Navîn û Cîhanê kir. Dewleta Tirk ya ku hebûna Tevgera Azadiyê û gelê Kurd tune dihesiband û êrişên qirkirinê pêk dianî, di 1’ê Cotmeha 2024’an de bi silavdayîna serokê MHP’ê Dewlet Bahçelî bi koma Partiya DEM’ê re pêvajo derbasî qonaxeke dîrokî bû.**R-3**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1322 | 5-Mijdar-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## ‘Armanca me amadekirina mamosteyên pispor e’



Rêvebera Peymangeha Amadekirina Mamosteyan a Bajarê Qamişlo Heyat Ebas diyar kir ku ji bo amadekirina xwendekarên sala 2025-2026’an pilansaziyên wan yên pêşeketî, guhertin û veguhertin hene û got, “Armanca me amadekirina mamosteyên pispor e.”**R-6**

## Ji çiraxên hunera Kurdî



Hunermend Dilo Doxan dengê afrîneriyê û kultûra Kurdî li sirgûnê ye û dê bimîne wek dengek zindî di bîrdanka hunera Kurdî de û wek çiraxek ji kultûrekî qet nayê vemirandin.**R-7**

# ALDAR XELÎL: SÎSTEMA NAVENDÎ KIRÎZÊN HUNDIRÎN GURTIR DIKE

Endamê Desteya Hevserokatiya PYD’ê Aldar Xelîl diyar kir ku hikumeta veguhêz a Sûriyê pabendî diyalogê nabe û îradeya wê ne di destê wê de ye. Herwiha Aldar Xelîl tekez kir ku sîstema navendî kirîzên Sûriyê gurtir dike û tenê rêya gihaştina Sûriyeke demokratîk pêkanîna sîstema nenavendî û hevgirtina gelên Sûriyê ye.**R-5**







## ‘Armanc û pîvanên me li ser bingeha sîstema federal e’

Serokê Ofîsa Siyasî ya Meclisa Naverast û Rojavayê Sûriyê Mistefa Rustem da zanîn ku avakirina meclisê li ser prensîpên adalet û azadiyê hatiye avakirin û sîstemeke federal ji xwe re esas digre.**R-4**




Malbata te! — Nehîr Pale — R-2


Dewleta Tirk barê Colanî giran dike! — Dilyar Cizîrî — R-4


Masa Aştiyê — Farûk Sakik — R-5

Ruhê biratiya Kurd û Tirkan nayê parastin — Zekî Bedran — R-5

# Bi hirî û morîkan teşeyên bedew diafirîne

Jinek bi navê Şehnaz Elî ku bi temenê xwe yê 50 salî li hember şert û mercên dijwar ên jiyanê serî hildaye, dirûnê hirî û çêkirina morîkan veguherandiye hunerek ku îradeyek û rûmetê îfade dike. Ew çîroka jinekê vedibêje ku qet teslîmî xizanî û bêhêvîtiyê nebûye.

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

Tevî van şert û mercên jiyanê yên dijwar, gelek jin derdikevin pêş û jiyana xwe ya rûbirûbûna bi dijwarîyan re bi xebata dijwar û afirîneriyê nîşan didin. Di nav wan de jinek heye ku dirûnê û çêkirina morîk kiriye pîşeyek ku dihêle ew malbata xwe xwedî bike. ew jî Şehnaz Elî ye, bi destên xwe yên ji ber xebata zêde hişk û dilê xwe yê tijî hêviyê, morîkên biçûk vediguherîne tabloyên hunerî.



Li yek ji taxên bajarê Qamişlo, jinek di warê karên destan de bê westan dixebite, jêhatiyên dirûnê yên hirî û morîkkirinê bi hev re dike yek, modelek rastîn a dayîn û afirîneriyê li hember pirsgirêkên aborî û civakî pêşkêş dike. Bi amûrên xwe yên hêsan, ev jin bi biryardarî projeyek biçûk ava dike ku îradeyek xurt û xwestekek dilsoz ji bo bidestxistina xweseriyê û parastina mîrateyek kevneşopî ya ku bi tunebûnê re rû bi rû ye, nîşan dide.

Şehnaz Îbrahîm Elî li ser karê xwe yê destan wiha dibêje: "Ez di karên destan de dixebitim wek çêkirina hirî û perçeyên morîk. Min ev pîşe di temenê biçûk de ji dayika xwe hîn bûm û bi pratîka berdewam, min di vî warî de jêhatîbûnek berfireh bi dest xist. Bi demê re, min xwest ku karê xwe pêş bixim, ji ber vê yekê ez tevlî koma "Xewnên Biçûk" bûm, komeke jinan ku jinên afirîner ên ku cûrbecûr yên cûreyên karên destan de dixebitin dihewîne."

Di destpêka karê wê de, ew rastî gelek zehmetiyan hat, wek mînak lêçûna zêde ya materyalan û zehmetiya bazarkirina berhemên wê. Lêbelê, bi hevkariyê û xebata tîmî di nav komê de, wan dest bi beşdarbûna pêşangehan kir. Eleqeya mirovan ji bo karê wan zêde bû û ew bêtir bi berhemên wan yên destçêkirî yên ku mîrat û çanda me ya herêmî nîşan didin, hatin naskirin.

Beşdarbûna Şehnaz Elî di van pêşangehan de ne tenê bi pêşandana berheman ve sînordar e, lê belê ew rêbazek e ji bo parastina nasnameya çandî û folklorê û veguhestina wan ji nifşekî bo nifşekî din. Her perçeyek ku ew diafirînin mohra mîrata me û bedewiya herêma me hildigire, afirînerî û jiyana jinan a dayînê nîşan dide.

Tevî zehmetiyên ku ew pê re rû bi rû dimîne, wek bihayên bilind ên madeyan û zehmetiya bazarkirinê, ew bê rawestan xebata xwe didomîne. Ji bo wê, çêkirina hirî ne tenê pîşeyek e, lê hunerek û peyamek e ku bi riya wê nasnameya jineke bihêz a ku dikare tevî hemû şert û mercan bide, diyar dike. Ew dibêje, "Dema ku ez hirî di navbera tiliyên xwe de digirim, ez hîs dikim ku ez jiyanê digirim. Ev pîşe ne tenê rêbazek ji bo debara jiyanê ye, lê di heman demê de ji bo giyanê min rehetiyek e jî."

Karê wê destan jê re bûye alîkarî ku ew karibe debara jiyana xwe bike û malbata xwe xwedî bike, herwiha pêşxistina karsaziyên biçûk teşwîq dike û ji bo jinên din jî derfetên kar peyda dike.

Şehnaz Elî li ser karê xwe wiha dibêje: "Ji bo min karê destan, ne tenê karek e, lê peyamek e ji bo parastina mîrata me û hêzdarkirina jinan da ku îspat bikin ku ew bi destên xwe dikarin afirîneriyê bikin û serfiraz bibin." Şehnaz Elî her wiha xeyal dike ku atolyeyek biçûk ava bike ku tê de jinên din ên ku derfetên kar tune ne bîne cem hev, hunera dirûnê û çêkirina bi morîk fêrî wan bike û ji hêla aborî ve wan bihêz bike. Ew bawer dike ku dema jin bi destên xwe dixebite, ew di jiyanê de ji bo xwe cihekî diafirîne û ji bo yên din jî hêviyê vedike.

Di serdemeke ku zehmetiyên jiyanê zêde dibin de, çîroka Şehnaz Elî mînakek geş a jineke kedkar temsîl dike ku ispat dike ku afirînerî ji bilî îradeyê tiştekî din hewce nake.

## Ji Pênûsa Jin

### Malbata te!

**Nehîr Pale**

Malbata te; Di nava civaka pêkhateya ereb de jin wexta ku bizewicê jêre tê gotin Malbata te (عيلتك), êdî mêr nasnameya wê ye. Jin piştî ku zewicî bi navê xwe yan jî li ser navê kurê xwe nayê nas kirin. Ne tenê dibe hevjîna mêr êdî ew jî mîna her tiştî dibe mulkê mêr. Cûdayî di navbera jinê û hemû xiradên mulkê mêr in, nîne. Pênaseya (Malbata te) heyanî hestûyên jinê bi wê didin hîs kirin ku tu mulkê hevjînê xwe ye. Bi vê gotinê maf didin mêr ku ew dikare her tiştî bi serê hevjîna xwe bike û ji civakê ti kes nikare destwerdana wî bike. Di zimanê erebî yê akademîk de dibe ku pênase û gotineke wisa nebe lê belê di zimanê şawî yê Kantona Tebqa, Reqa û Dêra Zorê ev yek ji bo jinê tê bikar anîn. Pênaseya Malbata te di navbera mêran de tê bikar anîn. Mêrek nikare navê hevjîna mêrekî dîtir bîne ziman, eger bikar bîne eyb tê dîtin an jî bi namûsê ve didin girêdan. Êdî jina zewicî bûye namûsa hevjînê xwe û dibe bi wî were naskirin.

Wexta mirov bi baldarî çand, ziman, adet û kevneşopiyên civakê lêkolîn bike em ê bibînin ku çawa desthilatdariya mêr tê parastin û berdewam kirin. Jin jî ne di ferqê de ye ku çawa koletî li ser wê tê ferz kirin. Berevajî, gelekî li kêfa jinê tê dema ku ew mulkê mêr were pênase kirin. Ji ber li beramberî gotin û pênaseyan bê bertek dimîne, yan jî wateya wê nizane û napirse ev gotin çima ji bo wê tê bikar anîn. Koletiya bi riya ziman, çand û kevneşopiyan li ser jinê tê ferz kirin li gel wê asayî ye. Jin keça bavê xwe û malbata hevjînê xwe tê nas kirin. Bi van rêbazan koletiya li ser jinê tê, rewa kirin û di hemû rewşan de mêr li ser jinê desthilatdar e.

Bi gotina Malbata te re mirov dikare kûrahiya mulkiyetê bibîne. Mulkiyeta jin ji mêr e û mulkiyeta mêr ji jinê re ne tenê asayî ye bi exlaq, şeref û namûsê ve hatiye girêdan. Ew mulkiyet di zîhniyet, çand û ziman de tê berdewam kirin. Eger koka mulkiyetê were lêkolînkirin wê were dîtin ew sedema hemû pirsgirêkên di navbera jin û mêr de. Her wiha bikaranîna pênaseya (Malbata te) dibe sedema wicûdê jinê were înkar kirin û dawî li hebûna wê bîn in. Civakên van peyv û pênaseyan bikar tînin zehmete dev jê berdin. Ji ber destpêke, bikaranîna van gotinan şaş nabîn in, hebûna jinê ji hemû aliyên jiyanê ve li gel wan ne girînge ku hebe yan na, jin bi xwe jî li hemberî van bêjeyan ne bi nakok e, ew jî mîna mêr difikire û şûna li hemberî rêbazên kolekirina jinê derbikeve, destek dide û diparêz e. Ji mêr zêdetir xwedî li zîhniyeta mêr û kevneşopiyên civaka zayendperest derdikev e. Dayîk di têkiliya xwe bi kurên xwe re, keç di têkiliya xwe ya bi bavê xwe re û jin di têkiliyên xwe bi hevjînên xwe re zîhniyeta mêr diparê zin.

# Zêdebûneke bifikar a kuştina jinan li Îranê

**Jîn Hisên/Qamişlo**

**Li Îran û Rojhilatê Kurdistanê kuştina jinan di bin hincetên cuda de hatiye rewakirin, êdî nefreta li dijî jinê normalîze bûye, lewma di salên dawî de zêdebûneke bi fikar di sûcên kuştina jinan de çêdibe.**

Komara Îslamê ya Îranê di sala 2025'an de jî binpêkirinên mafên mirovan ên bi rêk û pêk li hemberî jinan dewam dike. Bi taybetî jinên Kurd ên li Rojhilatê Kurdistanê hem ji ber nasnameya xwe ya etnîkî hem jî ji ber rola xwe ya zayendî ya civakî. Polîtîkayên rejîma Îranê yên ji bo kontrolkirina jinan bi qanûnên nixumandina ji neçarî, girtina jinan bi êşkence, lêdana qemçiyan û cezayên darvekirinê xwe nîşan didin. Di sala 2025'an de li Îranê û bi taybetî li Rojhilatê Kurdistanê binpêkirinên li hemberî jinan û zilma bi rêk û pêk bi berfireh tê nîşandan.

Li gorî delîlan; tê nîşandan ku sûc û şîdeta ji hêla dewletê ve li dijî jinên Îranî têne kirin ji sûcên malbatî zêdetir e. Îran rêza yekem digre di darvekirina jinan li ser asta cîhanê. Piraniya jinên ku cezayê darvekirinê li wan hatine birîn qurbaniyên zewaca bi temenê biçûk e û şîdeta malbatî ne, ku bi darizandineke ne adil hatin e sûcdarkirin.

**Rêjeya herî dawî ya kuştina jinan li Îranê**

Li gorî rapora ku ajansa NÛJINHA'yê amadekiribû di meha Tebax û Îlonê de hemjara jinên hatin kuştin gihaşt 17 jin û 8 zarok, 16 jinan hewildanên xwekuştinê kirirbûn û 7 jin hatin darvekirin girêdayî sûcên kuştin û madeyên hişbirê.




**Kuştina Jinan wekî Amûrek ji bo Kontrolkirina Civakî**

Yek ji faktorên sereke yên domandina kuştinên namûsê piştgiriya yasayî ya hikûmetê ji bo van sûcan û nebûna qanûnan e. Kujer dizanin ku qanûn ew ê piştgiriya wan bike û bi cezayên sivik re rû bi rû bimînin.

Kuştinên bi hincetên namûsê ne tenê amûrek malbatî ye ji bo "parastina navûdengê", lê belê beşek ji polîtîkayeke berfirehtir a hikûmetê ye ji bo rêgirtina ber guhertinên civakî. Di dehsalên dawî de, hebûna jinan di civakê de zêde bûye û daxwazên wan ji bo wekhevî û azadiyê berfirehtir bûne. Rejîma Îranê van guhertinan wekî gefek li ser desthilatdariya xwe dibîne lewma hem di asta giştî û hem jî di asta taybet de jinan hedef digire. Li ser asta giştî, rejîm bi sepandina hicaba mecbûrî, qedexekirina wan ji hin cihên giştî, ferzkirina sînorkirinên li ser karê wan û hewldana paşguhkirina wan; di bi zetx û zordariyê rû bi rû dihêle.

Li ser asta taybet, şîdet li dijî jinan tê hêsankirin. Piştgiriya qanûnî ji bo kuştinên namûsê, nebûna qanûnên parastinê û domandina çanda "parastina namûsê"; hiştiye ku jin di malên xwe de jî bêewle bimînin.

Bi van polîtîkayan, Îran hewl dide ku jinan di hundurê malê de bihêle, zilaman bike wekî amûr tenê ji bo şîdetê, bi vî rengî beşek ji bernameya bindestkirina jinan ji wan re veguhezîne. Vê stratejiyê ne tenê şîdeta li dijî jinan normalîze kiriye, lê di heman demê de qadên giştî ji bo wan ne ewle jî kiriye.

**Îran dewleta herê zêde jinan darve dike**

Li gorî malpera Konseya jinan a Encûmena Niştimanî ya Berxwedana Îranê hejmara jinên ku hatine bi darvekirin ji destpêka sala 2025'an gihaştiye 45 jin.

Îran xwedî hejmareke mezin û xeternak e di darvekirina jinan li ser asta cîhanî de. Li gorî daneyên Konseya Jinan di Encûmena Niştimanî ya Berxwedana Îranê, ji sala 2007'an biryara bidarvekirinê derheqê 308 jinan hatiye pêkanîn.

Jinên ku ji hêla rejîma Melalî ve têne darvekirin pir caran qurbaniyên şîdeta navmalî û qanûnên cudakar ên malbatê ne û gelek ji wan ji bo parastina xwe tevdigerin.

Di sala 2024'an de, 38 jin li Îranê hatine darvekirin.

Tenê di meha Mehr a Îranê de (23'ê Îlonê heta 22'ê Cotmehê), 280 girtî li girtîgehên cûda yên Îranê hatine darvekirin.



# Ji çiraxên hunera kurdî

**Can Yûsif**

Hunermend Dilo Doxan
"Dengê afrîneriyê û kultûra kurdî li sirgûnê"

Di rûyê hewldanên binpêkirin û pijavtina çandî de, hunermend û stranbêjên kurd ên hevdem wekî hilgirên xatîreyên nasnameya neteweyî û eniyek nermîn ji bo berxwedana çandî derketin holê, stranên wan veguhêrîne wekî belgeyên hebûnê, û awazên wan bûne vedenga dîrokekî tije ji têkoşîn û pêdariyê , bi rêya muzîka wan ku ji folklora kurdî diafirînin, û bi peyvên wan ku tije ji ruhê axê, ziman û xweparêziyê, wan rolek girîng lîstin di parastina bîrdanka civakî, zindîkirina çanda devikî û xurtkirina nasnameya neteweyî de , di demekê de ku hebûna çandî û zimanî ya kurdî di metirsîya tunekurinê re rûbirû bû, û di nav van pêşengên çandî de, hunermend Dilo Doxan wekî dengek resen yê miletê kurd, û balyozê mîrateya wê û xewna wê ya neteweyî diyar dibe,wî afirîneriya xwe da ji bo parastina mîrasa çandî, nasnameya neteweyî û zimanê kurdî ji wendabûn û jibîrkirinê.

Hunermend Dilo Doxan, kurê bajarê Tirbespîyê, yek ji stûnên bingehîn ên strana neteweyî ya hevdem a kurdî tê nasîn, ew li vê bajarî mezin bûye, yê ku tê nasîn di dîrokê de wekî mêrgek ji bo lêkborîn û biratiyê, navendeka zanîn û zanistê , û dîdargeha etnîk û olan. Tirbespîyê komek bijare ji navdaranên huner û wêjeya kurdî anî ye dunyayê , wekî Ciwan Haco, Xêro Ebas, şehîd Xebat, Izedîn Temo û Ebas Ehmed, nivîskar Xelîl Kalo, helbestvan Mizgîn Hesko û Tengezar Marînî, û Ronî Doxan û gelek ên din ên ku roleke girîng lehîstine di dewlemendkirina çanda kurdî û parastina mîrasê wê û nasnameya wê ya neteweyî de ,di nav baxên vê axa xweş û pîroz de, ya ku bû û hîn jî maye mehrava çand û mirovahiyê , Dilo di nav jîngehekî de mezin bû ,ku stran bibû zimanê dilan, û awaz di tamarê xwîna mirovan de diherikî wekî herkandina ava kaniyan li nav feraşînên Tirbespîyê , Di vê jîngeha tije ji nirxên welatparêzî û bîranînên rûmet û berxwedanê hunermend Dilovan Doxan di sala 1984'an ji dayîk û bavek kurd (Ebdulselam û Nesîbe) hatiye dinyayê ,ew mezin bûye di himbêza malbateka ku ji heşt zarokan pêk tê (7 kur û keçek) û ku hatiye nasîn bi welatparêzî û fedakariyên xwe ji bo doza kurd û parastina nasnameya neteweyî, ew di nav cihêkê de mezin bûye ku bi eşq û evîna ji bo axê, ziman û mîrateya kurdî tije bû ku ji zaroktiya wî ve, hezkirina hunerê, stranbêjî û folklora kurdî hatiye çandin, herwiha xweza û pîrozgehên cihê xwedêdana wî wekî xumxuma pêlên bendava Mizgeftokê , vedenga xuşîna çemê Cerahê, ringeringa zinglên dêra Meryema Ezra, yekem çavkaniyên hêrs û ilhama wî yên hunerî bûn ,wî awazên xwe ji pestînên sirûdên dêrên çiyayê Ezel û ji minareya bilind a bajêrê xwe wergirt ,li wir dengê erdê bi dengê giyan ve hate tevlihev kirin da ku tevneke hunerî ya bêhempa vehûne ku derbirîna nasnameya neteweyî ya rastîn bike , herwiha civatên gelê Tirbespîyê, bi nirxên xwe yên wekî comerdî, qehremanî, bûn çavkaniyên mijarên wî, stranên wî li ser lehengî û fedakariyê deng vedan ,bi vê awayî, ew bû yek ji sembolên efrînerîya hunerî li Rojavayê Kurdistanê, û dengê strana neteweyî ya berxwedanê, ku xemgînî û xewnên gelê xwe vediguhêzîne bi rêya peyv û awazan .

Hunermend Dilo di nav malbatekî hunerhez û navdar a kurdî de mezin bûye , ku li herêmên Cezîrê hatibû nasîn bi evîna xwe ya ji bo huner û çanda resen a kurdî, û şopeke xwe ya berbiçav di dîmena hunerî û çandî ya Rojavayê Kurdistanê hiştibû, ew birayê wênegirê navdar Deysem Doxan , û nivîskar û awazdêner Ronî û şêwekar Sabir Doxane.

Meylên wî yên hunerî, hezkirina wî ji bo stranbêjiyê û eşqa wî ji bo muzîka kurdî di temenek piçûk de destpêkir, hîn deh sal derbas nekir bû, ev yeke di bin bandora apê wî yê şehîd Xebat de bû, ku ew yek ji damezrênerên koma Hêzil bû, ji lewra Dilo di sala 1994'an tevlî vê komê bû, û bi riya wê dest bi beşdariya xwe di vejînkirina konser , cejnên Newrozan û helkeftên neteweyî kir, ji destpêka xwe de , wî tekez kir ku tevlêbûna wî bi nasnameya kurdî re dirûnî bû, û girêdana wî bi pirsgirêkên gelê xwe ve hêzdar bû.

Hunermendên Kurd ên navdar yên mîna Ciwan Haco, Xêro Ebas, Mihemed Şêxo, Şivan Perwer û yên din, bandorek mezin li ser têghiştina hişmendiya wî ya hunerî û neteweyî û pêşkeftina hinêra wî ya mûzîkî û pêşxistina têkildariya wî ya çandî kirin.

Dilo li bajarê xwe "Tirbespiyê" mezin bû, û dibistana xwe ya seretayî, navîn û amadehî li wir qedand , lê ji ber serjimêriya nerewa ku di parêzgeha Hesekê de di sala 1962'an de hate kirin, nekarî xwendina xwe ya bilind bidomîne, ev serjimêrî bû sedema ku sed hezaran Kurd ji wergirtina nasnameya Sûriyê bêpar bimînin, Dilo Doxan jî yek ji wan kesan bû ku biyanî û bê nasnameye ma û hate mehrûm kirin ji mafên xwe yên sivîl, li ser axa bav û kalên xwe , evê yekê bandorek kûr li ser kesayetiya wî û rêwîtiya wî ya hunerî hêla.

Destpêka wî ya hunerî vedigere destpêka salên 90'an , dema ku wekî sazvanekî li ser amûrên dengdanê dest bi kar kir , paşê ew fêrî jenandina amûra Ûd û sazê bû, êdî dest bi rêwîtiya xwe ya stranbêjiyê kir, û serkeftinekê zû jî bi dest xist,ku xelata yekemîn di fêstîvala mûzîkê ya ciwanan li Sûriyê sala 1995'an wergirt, ev yeke bû bingehê destpêka hêvîdariyek mezin û xweşbîn a rêwîtiya wî ya hunerî.

Di sala 2003'an de dest bi rêwîtiya xwe ya hunerî kir wekî hunermendek serbixwe, dema ku xweste ku bi stran û şahînetê rêya xwe bi şopîne, di vejînkirina konser û helkeftên neteweyî, navê wî di demek zû de di çarçoveya hunerî ya herêmî de çirisî , nemaze di fêstîvalên neteweyî de, wî karî bi şirînîya dengê xwe û rastiya hestên xwe, dilên temaşevanan bigire ,û hunera wî rolek bingehîn lehîste di vejînkirina stranên neteweyî de, di demek ku gotin di bin giraniya zextan de hatibû dorpêç kirin, tevî ku wî astengî û zordarî kişande , lê ew ji peyama xwe ya hunerî re dilsoz ma, û bawer dikir ku huner amûrek berxwedanê û rêyeke zelal e ji bo derbirîna nasnamê yê .

Wî bi riya awaz û gotinên xwe, derbirîna êşên gelê xwe û xewnên wî di azadiyê de kir , li ser bingehê ruhê girêdana bi axê û xweparêziyê ve ,li hemberî pirsgirêkên dijwar ên siyasî ku rûdidan.

Lê belê rêya hunerê bi gul û kulîlkan ne hatibû raxistin, Dilo Doxan ji hêla hêzên ewlehiyê ya Sûriyê ve hate astengkirin, neçar ma ku di sala 2009'an de ji bajêrê xwe yê ku bi rastî jê hezdikir, jê derkeve û berê xwe bide Almanya yê , li şûn xwe zarokiya xwe û bîranînên xwe hiştin, di dilê wî de hesretek ku agirê wê qet venamire û di çavên wî de hêstirên bêrîkirina dîtina welat û hezkiriyan, bi dijwarîya koçberîyê û xemgînîya jiyana xerîbîyê û êşkişandinê , Dilo dev ji hinêra xwe ya hunerî qet berneda ,lê ew mercên dijwar bûn sedemekî din ji bo wî, da ku Kariyera xwe ya afrîneriyê berdewam bike ,mîrasê çandî , nasnameya neteweyî û zimanê kurdî biparêze ji hewildanên jêbirinê û helandinê.

Bi veguhastina wî ber bi Ewropa ve, tayê hunerê qut nebû, lê şefeqa wê zêdetir bû, ew beşdarî festîvalên neteweyî û konserên revendên Kurdî bû, û dengê wî bû pireka girêdanê di navbera sirgûn û welat de , wî ji nivîsên ku derbirîna êşa kurdî û girêdana bi xak û ziman ve û li ser xerîbiyê û bîrkirinê
awaz çêkirin û stran gotin.



Dilo ne tenê hunermendeke an stranbêjeke ku hunera wî bi xwendina stranên filoklorî di dewatan û konsertan de sînordar dimîne , lê ew dengek zindî ye ji bo azadî û girêdana bi welatê xwe Kurdistanê û parêzvanên dilêr yên xaka wê re, wî ji bo welat û azadî, ji bo jina kurd a pêdar bi hêz û bedewiya wê, ji bo şoreş û şoreşgêran , herwiha ji bo evîn û bedewî, ji bo êş û hêvî, ji bo pêdarî û berxwedanê stran gotine û zêdetir ji 25 vîdyoyê klîb pêşkêş kirine ,ku pê pirtûxaneya hunerî ya kurdî dewlemend kiriye ,di riya karên xwe yên stanbêjiyê wî wijdana kurdî , êşa gelê xwe û doza wî ya neteweyî bi rastî û hisî îfade kiriye, ji klîbên wî yên navdar:

1- Gula Bi Tenê ( peyv û awaz Kerîmo Can)
2- Dildaro (peyv û awaz Behcet Hemo)
3-Bo Çi (Peyv û awaz Elend Ûsiv)
4- Ji Te Hesdikim (Peyv û awaz Kerîmo Can)
5-Çavên Te Reşin (Peyv :Dîlber Haco , Awaz : Ciwan Haco).

Hunermend Dilo di dema kariyera xwe ya hunerî , wî sê albûmên stranbêjiyê weşandin :

1- Albûma "Rebenê" 2004'an .
2- Albûma "Dildaro" 2008'an
3- Albuma( Hestên Dûriyê )2014'an.

Herwisa, Dilo ji bilî Albûman, gelek stranên singel yên cûda belav kirin, ku mijarên wan di navbera evîn û jiyanê, herwisa welat û berxwedanê ne.

Ew niha li Almanya di rûne û li welatên cuda yên Ewropayê tevlî konser û ahengên neteweyî dibe , ew di 7ê Tebaxa 2024'an de bi keçê Afrînê, Sîlda Hesûn re, zewicî ye.

Hunermend Dilo , serpêhatiya wî tenê bi stranbêjiyê nehat sinordar kirin; lê wî gelek stranên ji peyvên helbestvanên navdar kirine awaz mîna:

1- Hey Şehîd (Peyv :Diljan Cûdî)
2-Xwezî Yarê (Peyv:Xelîl Kalo)
3- Wey Kenê (Peyv: Narîn Omer)
4- Li Ber Pencerê (Peyv:Tengezar Marînî)
5- Jîna Emînî (Peyv:Rûken Silo).

Hunera wî qîrîneke di rûyê bîrbirînê de, û pireke di navbera paşeroj û îroyîn de dirêj dibe ,dengê wî êşa miletê xwe û hêviyên wan hildigire, ew bû balyozê hunera rastîn a kurdî, ku bi dengê xwe gund û bajaran, deverên sirgûn û koçberîyê digere , hesretê dike stranek , rûmetê dike awazek , berxwedanê dike sirûdek û sozekî dide ji bo Tirbespî û xwişkên wê bajarên herêma Cizîrê ku bimînin şahidên mayîna nasnameyê, her çiqas bahoz bibarin .

Bi saya hunermendên wek wî ,kultûra kurdî, zindî û nuhker maye, nehat jêbirin û pirsgirêkên demê nekarîn wê tunebikin, û ne jê bahozên dûrî û wendabûnê nekarîn wê bihejînin.

Bi vî rengê, Dilo Doxan bû beşek ji bîrdanka cihê xwe re, dengê wî bû mîna xumxuma bendava Mizgeftokê, nayê jêbîrkirin , wekî zengilên Meryem Ezra , vedenga wê qet melûl nabe , dengê wî ma vedenga nalînên cotkaran , pestînên dayîkan, û kenên zarokan li gundên dûr.

Di her straneka xwe de wijdana Tirbespîyê , hesreta Cizîrê û xewnên nifşên hesretvanên rûmet û azadî ji bo Kurdistana Mezin hildigirte .

Bi vî rengî Dilo Doxan maye, û dê bimîne, wek dengek zindî di bîrdanka hunera kurdî de. û wek çiraxek ji kultûrekî qet nayê vemirandin.

Daxwazên min ji bo wî serkeftin û afrînerîyek zêdetir di kariyera wî ya hunerî de.

# 'Armanca me amadekirina mamosteyên pispor e'

**Rêvebera Peymangeha Amadekirina Mamosteyan a Bajarê Qamişlo Heyat Ebas diyar kir ku ji bo amadekirina xwendekarên sala 2025-2026'an pilansaziyên wan yên pêşeketî, guhertin û veguhertin hene û got, "Armanca me amadekirina mamosteyên pispor e."**

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Ji bo pêşxistin û amedekirina mamosteyan di sala 2020`an de Peymangeheke Amedekirina Mamostyan li Qamişlo û Hesekê hat vekirin. Herwiha heya niha 3 girûp derçûne, di heman demê de di nava her girûpekê de jî hijmareke baş ji xwendekaran hebû. Di Peymangiha Amedekirina Mamosteya de 14 beş hene, ew jî ev in; Zimanê Kurdî, Zimanê Ingilîzî, Zimanê Erebî, Zanyarî, Civak, Felsefe, Bîrkarî, Bexçê Zarokan, werzîş, Şêwekarî, Mûzîk, Fîzîk û Kîmiya. Bêguman Peymangiha Amedekirina Mamosteyan gelek mamosteyên pispor derxistin, da ku nifşên nû bi awayekî pespor û zane werin perwerdekirin.

Di derbarê bername û armanca Peymangeha Amedekarina Mamosteyana bajarê Qamişlo, rêvebera Peymangehê Heyat Ebas ji Rojnameya me re axivî

### 'Armanca me avakirina kadiroyên pispor û jêhatî ye'

Heyat Ebas di destpêka axaftina xwe de wiha anî ziman: "Peymangeha Amadekirina Mamosteyan di sala 2020'an de hatiye vekirin. Ev jî di encama derçûna 70 xwendekarî ji pêvajoya amadeyî û pişytî pêşkêkirina ezmûna hevyazbariya zanîngeha me wek Peymangiha amadekirina Mamosteyan xwest ku van xwendekaran bi cih û xwendin bikin. Ji xwe di destêpêkê de du peymangehê me hebûn yek ji wan li bajarê Qamişlo bû û ya din jî li bajarê Hesekê bû, nêzî 400 xwendekar li Qamişlo xwe bi cih kir û 300 xwendekar jî li bajarê Hesekê xwe bi cih kirin. Piştî perwerdekirina van xwendekaran jî êdî serdanên kesê ku dixwazin xwe di peymangihê de tomar bikin zêde bûn. Lewma pêwîstî hat dîtin ku 2 peymangihên din werin amedekirin. Ji ber vê yekê me 2 pemangihên din vekirin, niha 2 pemangihên amedekirina mamosteyan li Qamişlo hene û 2 jî li Hesekê hatiye vekirin. Di heman demê de biranşên ku di peymangehê de dihat dayîn Zimanê Kurdî, Zimanê Ingilîzî, Zimanê Erebî, Zanyarî, Civak, Felsefe, Bîrkarî, Bexçê Zarokan, werzîş, Şêwekarî, Mûzîk. Ev jî bi armanca ku kadiroyên pispor û jêhatî ji peymangihê derkevin."

### 'Heya niha hijmarekî mezin ji xwendekaran derçûne'

Heyat di perdewamiya axaftina xwe de balkişand ser hijmara xwendekarên ku ji peymangihê derçûne û wiha adewam kir: "Heya dema me ya niha 3 komên xwendekarên peymangiha amadekirina mamosteyan derçûne. Koma yekem 224 xwendekar bûn, girûpa dûyem jî 200 xwendekar bûn û ya sêyem a sala 2025'an li Hesekê 80 xwendekar û li Qamoşlo 126 xwendekar derçûn. Me berî neha jî gotiye armanca me avakirina kadroyek pispor ji bo dakevin dibistanan, da ku nifşên nû baş fêr û perwerde bikin. Ji bilî vê jî di hundirê peymangihê de komisyon tên amadekirin, her wiha ku em karî bin van xwendekaran bi awayekî serkeftî perwerde bikin, ez dikarim bibêjim ku heya astekê peymangihên me baş tên qedandin lê heya niha sîstema me ya perwerdeya peymangiha mamosteyan ne gihiştiye wê asta ku em dixwazin, wê hewildanên me her dem hebin da ku pêşketinên mezin di hundirê perwerdeyê de ava bikin."

### 'Wê di sala nû de gelek guhertin werin çêkirin'

Heyat Ebas da zanîn ku ew ê di sala nû de gelek guhertin û veguhertinê di pemangehê de bidin çêkirin û wiha pê de çû: "Ji bo amadekirina xwendekarên sala 2025-2026 pilansaziya me yê pêşeketin, guhertin û veguhertinê heye. Bêguman gelek rêzecivîn di derbarê vê mijarê de tên lidarxistin. Hemû guhertinên ku werin çêkirin jî, wê ji bo pêşxistina xwendekaran be. Em hewil didin ku metiryalên xwe bikin cîhanî, bi taybet ji bo sala nû hijmarek pir mezin ji xwendekaran sardana peymangihê dikin û daxwaza wan ya xwendinê heye. Em hewil didin ku xwendekar li gor xwesetk û beşên ku bioxwaze xwe bihlbijêrin û li peymangihê xwe tomar bike, ji ber ku dema xwestek hebe wê hezkirina wan ji beşê wan re hebe, ev yek jî sedema serkeftina wan in. Di pilanên me yê sal nû de û piştî gelek civînan hat diyar kirin ku pêwîstiya dibistnan herî zêde bi mamosteyên Fîzîk û Kîmya hene. Ji ber vê yekê me vê salê biranşê Fîzîk û Kîmya tevlî beşên xwe yê peymangihê kirin û di demên pêş de em dikarin hîn beşan zêde bikin. "

### 'Em bi hêvî ne ku dibistanên me têr û tijî bibin'

Rêvebera Peymangeha Amedekarina Mamosteyan a bajirê Qamişlo Heyat Ebas di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Di destpêkê de hijmara mamaosteyan di peymangihê de tenê 50 bûn, lê niha her ku xwendekar zêde dibin ewqasî mamoste jî zêde dibin, em dikarin bêjin ku niha di peymangiha me ya Qamişlo de heya 60 mamoste hene. Ev mamosteyên me jî xwedî astekî pespor in û hêza wan a perwerdedayînê jî heye, di hemn wextî de metiryalê me yê sereke di Paymangihê de rêbaz e. Pêwîste her mamosteyek berî ku di aliyê îdelojî xwe fêr bike, destpêkê xwe di milê rêbaz de pêş bixe. Xwendekarên me yên ku ji peymangihê derdiçin cihek xwe yê girîng di dibstanan de digrin. Ji ber vê yekê em bi hêvî ne ku her xwendekarek xwedî li beşa xwe derkeva, di heman demê de xwe bi şavê mamosteyê perwerdekirina nifşê nû binêre. Ez ji hemû dil û cane xwe serkeftinê ji bo tevahî mamoste û xwendekaran dixwazim, di heman demê de ku em dibistanên xwe têr û tijî bikin, mamosteyên xwe jî bi pisporî bixin dibistanan."



# Li Kampa Waşokanî xebatên Heyva Sor a Kurd

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

**Ji destpêka avabûna Kampa Waşokanî ve, Heyva Sor a Kurd alîkariya koçberên kampê di warê tenduristî de dike. Herwiha rêveberê Heyva Sor a Kurd a li kampa Waşokanî Macid Ebdulqadir diyar kir ku ew li gorî derfetên xwe pêdiviyên tenduristî ji koçberên kampê re pêk tînin.**



Dewleta Tirk a dagirker di sala 2019'an de bi aweyekî hovane êrişî Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir, di encama êrişan de bajarê Serêkaniyê û Girê Spî hate dagirkirin. Ji ber êrîşên çeteyan piraniya gelên wan bajaran bi dare zorê hatin koçber kirin. Herwiha van koçberan berê xwe dane herêmên bi ewle yên Rêveberiya Xweser, ji bo bicihkirina van koçberan Rêveberiya Xweser kampa Waşûkanî û Serêkaniyê ava kirin. Di heman demê de, Kampa Waşokanî di sala 2019'an de hate avakirin û ev kamp 12 km dikeve rojavayê navenda bajarê Hesekê û li bajarokê Tiwênayê ye, di nava kampa Waşokanî de 1 hezar û 400 malbat û 17 hezar û 70 kes hene.

Ji destpêka avabûna Kampa Waşokanî ve, Heyva Sor a Kurd destek û alîkariya koçberan di warê tenduristiyê de dike. Herwiha sê beşên kilînîkên navenda Heyva Sor a Kurd li kampa Waşokanî hene, ew jî kilînîka hundirîn, kilînîka jinan û kilînîka zarokan e. Di heman demê de, navenda Heyva Sor a Kurd 24 seatan dibin xizmeta koçberan de ye.

Di derbarê kar û xebatên Hevya Sor a Kurd li kampa Waşokanî de, rêveberê Heyva Sor a Kurd a li kampa Waşokanî Macid Ebdulqadir ji Rojnameya me re axivî.

### 'Armanca me destekdayîna koçberan di warê tenduristiyê de ye'

Macid Ebdulqadir da zanîn ku armanca wan destekdayîna koçberan di warê tenduristiyê de ye û wiha got: "Ji destpêka avabûna kampa Waşokanî ve, Heyva Sor a Kurd hate avakirin. Ji wê demê ve heta niha alîkariya koçberan di aliyê tenduristiyê de dike. Di heman demê de, di navenda me de Kilînîk hene, ew jî kilînîka zarokan, kilînîka hundirîn û kilinîka jinan e. Herwiha di navenda me de, piştgiriya piskolojîk, teqîgeh, dermanxane û embulansek ji bo rewşên lezgîn ji bona 24 seatan jî amede ye. Dema ku rewşeke ewarte derbasî navenda me dibe, em têkilyê bi beşê niştîgariyê ya li nexweşxaneya gel re dikin. Ji ber ku kel û pelên tenduristî li cem wan peyîda dibin."

### 'Karê me erkekî mirovî ye'

Ebdulqadir anî ziman ku rêxistinên di warê tenduristî de, di nava kampa Waşokanî de dixebite tenê Heyva Sor a Kurd e û wiha pê de çû: "Di nava kampa Waşokanî de, tenê Hevya Sor a Kurd di warê tenduristiyê de destek û alîkariya koçberên kampê dike. Herwiha barê herî giran li ser milê Heyva Sor a Kurd e. Di navenda me de sê bijîşk hene, ew jî bijîşkên zarokan, jinan û hundirîn in. Astengiyên ku em dibînin ew jî, ji ber ku di kampa Waşokanî de, bi giştî embulanseke tenê ji bo rewşa lezgîn heye. Em her tim hewl didin ku pêdiviyên koçberên Kampa Waşokanî yên di warê teduristî de peyda bikin. Herwiha ji aliyê dermanan ve tu kêmasî tune ne û em li gorî derfetên xwe pêdiviyên tenduristî ji koçberên kampê re bi cih dikin. Di heman demê de, ji ber ku kampa Waşokanî kampek vekiriye, lewra çi rewşên ku derbasî kampê bibe em wek Heyva Sor ku bi erkekî mirovî radibin bi wan re dibin alîkar."

Rêveberê Heyva Sor a Kurd a li kampa Waşokanî Macid Ebdulqadir eşker kir ku di rojê de nêzî 45 nexweş serdana navenda wan dikin û wiha bi dawî kir: "Di rojê de nêzî 33 ê zarok û jinên nexweş serdana navendê dikin. Herwiha pêwîst e rêxistinên navdewletî destekê bidin Heyva Sor a Kurd a li kampa Waşokanî, ji ber ku barê herî giran li ser milê Heyva Sor a Kurd e."



# Diyalogên di navbera Îmralî û Tirkiyê de...(1)

**Bi banga dîrokî ya Rêber Apo ku di 27'ê Sibatê de kiribû dengvedanek li Rojhilata Navîn û Cîhanê kir. Dewleta Tirk ya ku hebûna Tevgera Azadiyê û gelê Kurd tune dihesiband û êrişên qirkirinê pêk dianî, di 1'ê Cotmeha 2024'an de bi silavdayîna serokê MHP'ê Dewlet Bahçelî bi koma Partiya DEM'ê re pêvajo derbasî qonaxeke dîrokî bû.**

**Amara Baran/ Qamişlo**

Dewleta Tirk bi sala ye ji bo ku tevgera azadiyê ji holê rake her cûre êrîşan pêk anî. Lê dît ku tekoşîn û berxwedaniya PKK'ê di cîhanê de mînaka wî nîne neçarma ku rastiya kurd û Kurdistanê qebûl bike. Serokê MHP'ê dewlet Bahçelî ku di Sala 1999'an de di meclîsê de beneke avêt û got ku" vî bene bigre û wî bi darve bike". piştê ewqas salên dirêj ku bi dagirkirin û qetlîaman dagirtî bû. Di 1'ê Cotmeha 2024'an de Serokê MHP'ê Dewlet Bahçelî carekedin di vekirina Meclîsa mezin ya Tirkiyê de destê xwe dirêjê Koma Partiya DEM'ê kir û got" ji bo rakirina tecrîdê, divê Abdullah Ocalan were parlementoy "hilweşandina tevgerê di nav koma Partiya DEM de ragihîne" ku bikaribe mafê xwe yê hêviyê bikar bîne. Ev nirxandinê Bahçelî di serê gelê Kurd û Tirk de nakokî dan avakirin. Bi banga Dewlet Bahçelî re û bersivdayîna Rêber Apo re pêvajoyeke dîrokî destpêkir.

### Agirbestên yekalî yên ku ji aliyê Tevgera Azadiyê ve hatine avêtin

Tevgera Azadiya Kurdistanê ku dem bi dem agirbest îlan kiriye, di pêvajoya agirbestê de ew bi isar li aliyê aştiyê ne, wê pêvajoyên pevçûnê bi dawî bibin. Tevgera Azadiya Kurdistanê heta niha di salên 1993, 1995, 1998, 1999, 2006, 2009 û 2013'an de agirbest û serdemên rawestandina têkoşîna çekdarî pêk aniye. AKP'ê pêvajoya aştiyê ya sala 2013'an sabote kir û bi destpêkirina êrîşan re bi dawî bû. Tevgera Azadiya Kurd heta banga Rêber Apo ya 27'ê Sibata 2025'an têkoşîna



çekdarî ji nû ve dabû destpêkirin. Ev nêzê şalakiye ku pêvajoya aştî û civaka demokratîk dest pêkiriye jî lê heta niha ji aliyê Dewleta Tirk ve gavên pêwîst nehatine avêtin. Rûxmê ku tevgera azadiyê bi îradeya xwe ya azad çêkên xwe îmhakirin lê heta niha jî axaftina zimanê kurdî û girtin û talana xwezaya kurdistanê didome. Heman demê de tecrîda li ser Rêber Apo û rewşa girtiyên ku di girtîgehên Tirkiyê de ne nehatiye guhertin.

### Ji 1'ê Cotmehê 2024'an heta Niha çi çêbû

Di 1ê Cotmeha 2024an de, bi destdirêjkirina Serokê MHP Dewlet Bahçeli bi koma Partiya DEM re bingehek ji bo diyalogê ava kir. Û mijara tecrîda li Îmraliyê bi berdewamî hate rojevê. Bahçeli di axaftina xwe ya, parlementoyê ya di 22 ê Cotmeha 2024'an de, diyar kir ku ji bo rakirina tecrîdê, divê Abdullah Ocelan were parlementoy "hilweşandina tevgerê di nav koma Partiya DEM'ê de ragihîne" ku bikaribe mafê xwe yê hêviyê bikar bîne. Ev nirxandinên Bahçelî hem ji bo qebûlkirina hebûna tecrîdê û hem jî ji bo têgihîştina rola Rêber Apo girîng bûn.

Di 8ê Cotmeha 2024an de Dewlet Bahçelî di koma xwe ya Meclisê de anî ziman ku destdayîna DEM Partiyê peyama xwişk û biratiyê ya yekîtiya mîllî ye."

Seroka Giştî ya DEM Partiyê Tulay Hatîmogullari bersîv da Dewlet Bahçelî û got: "DEM Partî ji xwe partiya Tirkiyeyê ye. Em aştiyek bi rûmet dixwazin. Em ji muzakere û diyalogê re amade ne."

Di 9ê cotmeha 2024an de Tayyip Erdogan di koma Partiya xwe ya li Meclisê de piştgirî da Dewlet Bahçelî û got: "Li welatê me pêtir bêdivî bi axaftin, lihevkirin û avakirina zemîna diyalogê heye. Bendewariya me ewe ku bêyî cudakarî bê kirin, hemû partiyên siyasî yên li meclisê divê li gorî vê ferasetê tev bigerin."

Di 17ê Cotmeha 2024an de Hevserokên DEM Partiyê Tulay Hatimogullar û Tuncer Bakirhan, Selahattin Demirtaş û Selçuk Mizrakli li girtîgehê ziyaret kirin. Selahattîn Demirtaş û Selçuk Mızrakli diyar kirin ku ji bo aştiyek bi rûmet amade ne bi her awayî piştgiriyê bidin. Xwestin ji bo çareseriyê tecrîd bi dawî bibe. Deriyê Îmraliyê piştî 43 mehan vebû Piştê banga Serokê MHP'ê Dewlet Bahçelî û piştê demeke dirêj cara yekem di 23 cotmehê de hevdîtinê malbatê bi Rêber Apo re çêbû. Di hevdîtinê de Rêber Apo peyamek pir zelal da:" Ger şert û merc guncaw bin, ez xwedî hêza teorîk û pratîkî me ku vê pêvajoyê ji bingeha şer, pevçûn û tundûtûjiyê veguhezim bingehek qanûnî û siyasî." ev nirxandinên Rêber Apo rêveçûna pêvajoyê da destnîşankir.

Di 23ê Cotmeha 2024an de Parlamenterê DEM Partiyê Omer Ocalan, piştî 43 mehan çû Îmraliyê û bi Rêber Apo re hevdîtin kir. Rêber Apo di peyama xwe de got 'Tecrîd berdewam dike. Heke şert û merc ava bibin, hêza min heye ku ez pêvajoyê ji zemîna şer û pevçûnê veguherînim ser bingeha hiqûq û siyasetê. Ez xwedî vê hêza teorî û pratîk im.'

Di 24ê Cotmeha 2024an de KCKê daxuyanî da û got: "Tecrîd didome. Heta tecrîd ranebe, divê kes ne li bendê be ku Rêber Apo rista xwe bilîze."

Di heman rojê de Endamê Konseya PKKê Murad Karayılan, roportaj da Yenî Yaşamê û got: "Lêgerînên çareseriyê ku azadiya Rêber Apo esas negire, bêhukm in.

Li aliyekî hevdîtin li aliyê din qeyûm Di 28'ê Kanûnê de şandeya partiya DEM'ê ku ji Siri Sûreyya Onder û Pervîn Buldan pêk dihat bi Rêber Apo re hevdîtin kirin û diwî hevdîtinê de Rêber Apo diyarkiribû ku "Nûkirina tifaqa Tirk-Kurd berpirsyariyeke dîrokî ye û divê hemû derdorên siyasî ji bo aştiyê hesabên teng deynin aliyekî.

Di 2'yê çileya 2025an de Şandeya DEM Partiyê ya Îmraliyê dest bi ziyaretên partiyan kirin. Di 2yê Çile de MHPê di 6ê çile de AKP, Partiya Siberojê û Saadet, di 7ê çile de CHP, Partiya Ji Nûve Refah, DEVA ziyaret kir.

Di 11ê Çileya 2025an de Şandeya DEM Partiyê ya Îmraliyê bi Selahattin Demirtaş re hevdîtin kir. Demîrtaş diyar kir ku ew heta dawiyê piştgiriyê dide Rêber Apo.

Di 14ê Çileya 2025an de Dewlet Bahçelî anî ziman ku ziyareta şandeya DEM Partiyê ya îmraliyê erênî ye. Divê di hevdîtinek din de bibêje PKK xwe bi dawî kiriye.

Di 18ê Çileya 2025an de Erdogan daxuyanî da û diyar kir ku gav nêzî encamê dibin û serokê rêxistinê tişta pêwist pêk bîne û qada siyasî jî erka xwe pêk bîne, dê 81 bajar û 85 milyon însan qezenc bike..

Di 22ê Çileya 2025an de Şandeya DEM Partiyê ya Îmraliyê cara duyemîn çû Îmraliyê û bi Rêberê Apo re hevdîtin kir. Rêberê Apo anî ziman ku xebatên wî yên ji bo çareseriyê didomin.

Di 28ê Çileya 2025'an de Serokê MHPê Dewlet Bahçelî di koma partiya xwe de hevdîtinên di navbera Şandeyê û Îmraliyê de çêbû.

Di heman rojê de Hevseroka DEM Partiyê Tulay Hatimogullari, peyama Rêberê Apo aşkere kir. Anî ziman ku hewldana Bahçelî dê bibe sedema gaveke dîrokî.

# 'Rêxistina Nûdem ji bo destekdayîna astengdaran herdem amade ye'

**Solîn Mihemed/ Hesekê**

**Rêvebera Rêxistina Nûdem Ya Amadekirin û Geşedanên Mirovî Ya Astengdaran Daviyan Mehmûd diyar kir ku Rêxistina Nûdem ji bo destekdayîna astengdaran kar û xebatan dide meşandin û wiha got: "Ji bo destekdayîna kesên astengdara herderm deriyê me vekirî ye û em amade ne."**

Rêxistina Nûdem di sala 2021'ê ve li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate avakirin û navendên xwe li gelek bajaran vekir. Rêxistina Nûdem li gor derfetên heyî xwe digihêne astengdarên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dijîn û dibe dengê wan.

Di derbarê kar û xebatên Rêxistina Nûdem Ya Amadekirin û Geşedanên Mirovî Ya Astengdaran rêvebera wê Daviyan Mehmûd ji rojnameya me re axivî.

### 'Kar û xebatên me baş têne meşandin'

Daviyan Mehmûd bal kişand ser xebatên Rêxistina Nûdem û wiha got: "Kar û xebatên me yên ku têne meşandin, destpêkê hişyarkirina civakê ji bo kesên astengdar û piştre perwerdekirina kesên astengdar e. Ji xwe di perwerdekirina malbatên astengdaran de zehmetî hene, ji ber gelek malbat hene xwe didin alî, me jî xwest ku em vê şerimkirinê ji serên wan rakin da zarokên wan werin perwerdekirin û me gelekî jî xwe gihand kesên astengdar da ku em alîkariya wan bikin. Ji 2021'ê heya roja îro me navendên xwe li hin bajarên weke Hesekê, Kampa Waşokanê, Kampa Serêkaniyê, Taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê û Tebqa ji bo kesên astengdar vekirin, da ku di riya van navendan em xwe bighînên hemû kesên astengdar. Ev navend jî kar û xebatan didin meşandin. Di her mehekê de nêzî 50'î zarok tên perwerdekirin û her kesekî astengdar li gorî wê perwerdeyê didin. Gelek pirojeyan em didin meşandin wek pirojeyên li hin bajarên ku li ser sê mihan perwerdeyên astengdaran dihatin vekirin, dihat meşandin. Ji xwe piştî perwerdeyê kesên astengdar yê ku dikarîbûn tevlî dibistanan bibin me wan tevlî dibistanan dikirin."

### 'Gelek pirojeyên me ji bo demên pêş hene'

Daviyan Mehmûd anî ziman ku wan komxebatek lidarxist û wiha berdewam kir: "Konxebata ku me lidarxist bi tevlîbûna kesên astengdar, malbatên kesên astengdar, civak, ragihandin û rêxistinên civaka sivîl bû. Ji xwe armaca me zêdekirina jêhatîbûna kesên astengdar di komxebatan de û rakirina hişmendiya biçûxistina astengdaran di nava civê de bû. Gelek pirojeyên me ji bo dema pêş hene, bi taybet ji aliyê tendurstî de û vekirina hin cihên tedawiya fîzîkî ku ji bo kesên astengdar li wir bên dermankirin. Em zêde guh didin pirojeyên perwerdeyê, ji ber ku heta niha dibistan û cihê perwerdê yên ji bo astengdaran nehatine çêkirin."

### 'Ji bo jêhatiyên astengdaran me kom çêkirin'

Rêvebera Rêxistina Nûdem Daviyan Mehmûd axaftina xwe wiha qedand: "Ji ber jêhatiyên astengdaran me kom dane çêkirin, kesên ku dixwazin fêrî sitranan an tekînêkê bibin em wan perwerde dikin, da ku di demên pêş de ew jî di karên saziyan yan jî karên




tayîbet de cihên xwe bigirin, herwiha komên karên destan jî hatine çêkirin. Perwerde li gor kesên astengdar ku di kîjan aliyî de karibin û bixwazibin em dest bi din wan û wan perwerde bikin. Ji xwe perwerdeyên zarokan bi tayîbet nivîsandin e, xwendin e, fêrbûna tîpan, rengan, hejmaran ji ber ku dibistan tune ne ku tevlî bibin ji ber vê yekê jî em li cem xwe wan fêr dikin. Ji xwe rêxistina me her tim ji astengdaran re vekirî ye û heya ku em karibin jî em ê alîkariya her kesekî astengdar bikin."

# ‘Armanc û pîvanên me li ser bingeha sîstema federal e’

**Serokê Ofîsa Siyasî ya Meclisa Naverast û Rojavayê Sûriyê Mistefa Rustem da zanîn ku avakirina meclisê li ser prensîpên adalet û azadiyê hatiye avakirin û sîstemeke federal ji xwe re esas digre.**

**Zana Roj/Qamişlo**

Meclisa Siyasî ya Naverast û Rojavayê Sûriyê di 27’ê Tebaxa 2025’an de ji aliyê kesayetên siyasî û çalakvanan ve bi armanca temsîlkirina herêmên Berava Sûriyê û daxwaza sîstemeke federal a hikûmetê li şûna sîstema navendî ya heyî hate damezrandin. Têkildarî vê mijarê Serokê Ofîsa Siyasî ya Meclisa Naverast û Rojavayê Sûriyê Mistefa Rustem bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:



**Encumena Siyasî ya Naverast û Rojavayê Sûriyê li ser çi prensîb û bingehan hatiye damezrandi, herwiha armancên wê çi ne?**

Prensîpên bingehîn a ku Meclisa Siyasî ya Naverast û Rojavayê Sûriyê li ser hatiye avakirin, edalet, azadî û ilmanî ye ku em li ser avakirina sîstemeke federal di xaka Sûriyê de bixebitin. Ji ber tenê sîstema federal ew rêya ber bi aştî, bidawîkirina şeran û çareserkirina pirsgirêkên di Sûriyê de ye. Ji ber wê pîvanên ku meclis li ser hatiye avakirin, ew pîvanên ku hemû Sûriyan di nava xwe de digre bi taybet di Navîn û Rojavayê Sûriyê de ku sîstemeke federal bê avakirin li ser bingeha adaleta civakî, rêvebirina bi ilmanî û avakirina zagonên nûjen ku berjewendiya hemû gelan biparêze, herwiha di encama van şerên ku hatine rûdan de veguheztina rewşa gel ji rewşa şer ber bi aramiyê ve. Armancên me jî li gorî pîvanên ku me dane diyarkirin in, lê belê makanîzmeya bicihanîna armancan ew girîng e ku em çareseriyeke siyasî, qebûkirineke siyasî ji meclis û fikrandinên wê re bibînin. Da ku em van hemûyen bikin xizmeta rastiya gel û ji pêvajoya avakirin û istiqrarê, ya rast dest pê bikin û ber bi istiqrara tevahî rewşa Sûriyê ve bimeşin.

**Wek meclis, hûn polîtîkayên hikumeta veguhêz çawa dinirxînin û divê çi gavên qanûnî biavêje?**

Ji siyaseta ku niha ya ku aliyê hikumeta veguhêz ve tê meşandin, ew siyaseteke qirker û radîkal e, ku naşibe siyaseta tu dewletan û bi her awayî ji fikira avakirina dewletê dur e. Xebata ku hikumeta veguhêz dike bi grûpên çete tê birêvebirin. Yanî ji piratîka ku tê kirin durî serdem û pêvajoya ku em tê de jiyan dikin e, her wiha durî pêdiviyên gel û siyaseta ku divê di Sûriyê de bê meşandin, ev fikir û piratîk durî mentiqê ye. Ev siyaset ji îdeolojiya ku ev kes li ser hatine mezinkirin a ku me aniye ziman siyaseta durxistin, tunekirin û pêkanîna sûcan e. Di aliyê pêkanîna qanûnî de, bi nêrîna me ev kes gelekî durî rastiya qanûnê ne. Ji ber ku me di hilbijartin, erkdarkirina rayadarên meclisan û hwd.. de bi taybet ew konferansa diyaloga niştîmanî ya ku hatiye lidarxistin, em tenê dikarin wê yekê bi şanoyekê bişibînin. Li ser wê esasê ger wê gav bên avêtin wê di serî de hemû pêkhateyên Sûriyê vegerîne û hebûna pêkhateyan ji nû ve bigre ber cavan. Ya din hevgiritina hemû gelên di Sûriyê de ji bo avakirina çareserî û jiyaneke hevpar.

**Di çarçoveya hiqûqa navneteweyî de ji bo hesabpirsîna sûcdarên tawanên Beravê we çi gav avêtin?**

Di çarçoveya gavavêtinên ji aliyê me de hatine avêtin, me hemû kiryarên ku hatine kirin belge kirine û ji aliyên navnetewî re rêkirin, herwiha hemû bûyer, sûc û kiryarên ku rojane li Beravê çêdibin, tên belgekirin. Helbet ev yek beriya ku meclis bê avakirin jî dihat kirin, hin endamên ku di meclisê de cihê xwe digrin di van mijaran de pispor û xwedî tecrûbe ne. Niha li gel me arşîvekî têr û tijî ku hemû kiryar û sûcên dijmirovî hatine kirin, belgekirî di destê me de ne. Em bi van belgekirinên ji sûc, kiryar û nêzîkatiyên ku ji aliyê van koman ve hatine kirin, em bawer in ku me bi vê yekê sînaryo û siyaseta ku dihat û tê meşandin rast xwendiye û nirxandiye. Ji ber ev desthilatdarî, desthilatdariyeke sûckar e û nikare ji îdeolojiya cîhadîst ya kufrî ya ku jê hatiye derkeve. Ev yek jî wê ji aliyê peywendîdar, sazî û rêxistinên mirovê yên navnetewî re werin şandin.

**Ji bo avakirina Sûriyeke nû, piralî û demokratîk li ser bingeha rêzgirtina mafên hemû pêkhateyan, ji gelê Sûriyê bi hemû pêkhate û rengên wê çi tê xwestin?**

Ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk û pirreng, divê hemû pêkhate û rengên di Sûriyê de di konferanseke diyalogî ya niştîmanî de bên gel hev. Da ku bi hev re li hember bidawîkirina vê desthilatdariyê bisekinin a ku nikare xwediyê fikir û bîrdoziyeke ku ji gelê Sûriyê re asoyên berfireh veke. Divê yekîtiyek li hember vê desthilatdariyê bê avakirin. Di heman demê de divê em ji bîr nekin ku kesayetên hêja ji Suniyan hene ku ew jî li dijî sîstema berê a rêjîma Baas serî hildan. Ji ber wê ji hemû gelê Sûriyê tê xwestin ku li hember van hişmedî û zihniyetan bibin yek û rê nedin ku ev desthilatdarî hebûna cudabûna pirrengbûna Sûriyê bixetimînin.

# Mafê hêviyê û azadiya Rêber Apo; hêviya serdemê

**Hemza Sêvo**

Wateya mafê hêviyê di pênaseya xwe ya giştî de, amaje dike ku dema kesayetek di girtîgehê de be û azadiya xwe winda kiribe, tevî ku salên hukim lê hatibe birîn an jî hukim mayînde li ser hatibe ferzkirin, dikare hêvîya xwe, xewn û xeyalên xwe winda neke. Herwiha ev têgeh di naveroka xwe de destnîşan dike ku eger hukim li ser girtiyekî/ê hatibe kirin, divê hukim li ser esasê arastkirin û sererastkirina çareseriyê bê kirin û piştî demekê derfetek ji bo wî/wê were dayîn. Ev têgeh yekem car ji hêla Dadgeha Ewropayê ya Mafê Mirovan ve di sala 1950’î de hat derxistin, bi wateya ku maf ji bo kesên girtî yên ku hukmê mayînde li wan hatibe birîn, tê dayîn piştî ku demeke destnîşankirî ew kes azad bibe. Herwiha yekem car mafê hêviyê sala 1977’an di dadgeha destûrî ya Elmaniyê de hat pêkanîn. Yek ji mercên wê ew e ku mirovê di zindanê de be piştî 20 salan ji deman girtinê were berdan. Lê cîhan, rêxistinên hiqûqî û saziyên di bin serweriya hêzên hegemon zagona mafê hêviyê bin pê dikin. Ev zagon tenê di derheqê Rêber Apo de tê binpêkirin. Wekî tê zanîn ev 26 sal in Rêber Apo di bin tecrîd û komployan de ye. Berdewambûna tecrîdê tenê tiştekî destnîşan dike, ew jî piştgirtiya Dadgeha Ewropayê ya Mafê Mirovan ji dewleta Tirk re ye. Dewleta Tirk yek ji dewletên ku li ser vê biryar û zagonê îmze kir, ev yek jî tê wateya ku ew zagona bi destê xwe îmze kiriye û bin pê dike. Herwiha zagonên cîhanî li gorî berjewendiyên hêzên hegemon û desthilatdar tên îmzekirin. Bûye bêtirî salekê ji destdayîna Bahçelî, dema ku bal kişand li ser destpêkirina pêvajoyeke nû. Ew axaftin di rewşeke hestiyar de hatin kirin, Rêber Apo di 27’ê Sibata 2025’an de banga dîrokî kir. Ew bangeke dîrokî bû ku bû bingeha avakirina pêvajoyeke cîhanî ji bo pêkanîna aştiyê li Tirkiyê û Kurdistanê, herwiha tevahiya herêmê. Piştî wê kongreya 12’emîna ya PKK’ê li çiyayên Kurdistanê hat lidarxistin û tê de biryarên girîng hatin dayîn. Yek ji wan biryaran çekşewtandin bû, vê bûyerê jî rojeveke cîhanî ava kir, gaveke watedar bû, Gerîlayên Azadiyê tekez kirin ku çek û bombe, aştiyê û demokrasiyê nayînin. Piştî vê gavê jî PKK’ê di çarçoveya banga Rêber Apo ya pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de biryareke istratîjîk girt û Gerîlayên şoreşger ji Bakurê Kurdistanê di 26’ê Cotmehê de vekişand. Ne ku min weke dewleta Tirk mafê hêviyê û gelek mijarên zagonî ji bîr kiriye, lê rastiya pêvajoyê wiha ye, hîna pêvajo yekalî bi rê ve diçe. Hîna erka exlaqî û zagonî ya ku dikeve li ser milê Bahçelî, Erdogan, hikumeta Tirkiyê, nehatine pêkanîn. Yek ji van erkan ew e ku azadiya Rêber Apo pêk were, yan jî mafê hêviyê ji bo Rêber Apo were dayîn. Tevî ku hevdîtin di navbera malbat, parêzer, şandeyan û Rêber Apo de çêdibin, lê hîna tecrîd dewam dike. Rêber Abdullha Ocalan ji ber tecrîdê nikare agahî û rûdanên ku li herêma Rojhilata Navîn rû didin, bişopîne. Ew xwedî çareserî, plan, doza demokratîkbûn û aştiyê ye. Ew hêja ye ku azad bibe yan jî mafê hêviyê di derheqê wî de were dayîn, divê neyê jibîrkirin ku mafê hêviyê zagoneke û divê ji bo wî were pêkanîn. Ji ber ku azadî û mafê hêviyê ji bo Rêber Apo hêviya gelên bindest a serdemê ye.



## Dewleta Tirk barê Colanî giran dike!

**Dilyar Cizîrî**

Di 8’ê kanûna 2024’an de rêjîma Baas hilweşiya û dawî li desthildariya malbata Esed a 53’an hat. Ji roja destpêkê de dewleta Tirk dest bi tevgerê kir û xwest rêjîma nû li gorî berjewendiyên xwe formîle bike. Komên girêdayî xwe yên li Efrîn, Serêkaniyê û deverên din ên di bin dagirkeriya wan de bû, xistin tevgerê û wan di Wezareta Parastinê de bi cih kir. Çeteyên xwe yên biyanî “Huras El-Dîn” di asta herî jor de nava hikumeta veguhêz de, Bi vê yekê qadên sereke yên hikûmeta Colanî bi destê istxbarata Tirkiyê ve tê rêveberin.
Ji ber berjewendiyên dewleta Tirk û Îsraîl, Birîtaniya û Amerîka li hev ketin. Serokê Veguhêz Ehmed El Şeri ku dixwest di qadên navdewletî de xwe wekî dewleta mafê her kesî biparêze diyar bike, lê ji ber bê rêkûpêkiya hikumeta wî, komkujiyên Beravê û Siwêdayê bi destê çekdarên Wezareta Parastinê pêk hat. Her çendî hêzên navdewletî dixwazin berjewendiyên xwe biparêzin, ji ber wê jî hikumeta veguhêz rewa nîşan didin. Lê ji ber tevgera nerêxistinkiriî ya komên girêdayî dewleta Tirk, hikumeta veguhêz a Sûriyê nikare, peymanê îmze bike. Wekî nimûne dema çekdarên HTŞ’ê ketin Berava Sûriyê soz da Elewiyan heger çekên xwe radestî wan bikin, ew ê ewlekariya wan parastî be. Bi komkujiyên meha Adarê re ev soz têk çûn. Sozên wan bi civaka Durzî re hebûn û rêzecivîn bi şxên civaka Durzî re li dar dixistin. Ji ber di nava hikumeta veguhêz de komên girêdayî Tirkiyê li derveyî biryarên wezaretan tevdigerin, sozên bi Durziyan re jî têk çû. Komkujiya Tîrmehê isbata wê ye. Sozên başkirina rewşa aborî gelek hatin dayîn, lê ji ber destwerdana dewleta Tirk di aboriya Sûriyê de rewşa aborî her diçe xirabitir dibe. Di bin navê başkirina rewşa elektrîkê, projeya anîna xaza Ezerbêjanê xistin rojevê, ne elektrîk baş bû û ne pirsgirêk çareser bûn. Ji bo têkçûyînên xwe veşêrin niha bi rêjeya ji sedî 60 buhayê elektrîkê zêde kirine. Ev biryara wan rastî nerazîbûn û helwesteke dijber a civakê hatiye.
Di aliyê aborî de jî dewleta Tirk bi hemû hêza xwe di nava tevgerê de ye, berhemên xwemalî yên Sûriyê tune bike. Da Sûriyê bibe bazarek vekirî ji berhemên Tirkiyê re. Ji xwe mijara herî zêde bi bandora destdirêjiya dewleta Tirk de naghêje encamê têkiliya bi Rêveberiya Xweser û QSD’ê re ye. Peymana 10’ê Adarê di navbera Fermandarê Giştî yê QSD’ê Mezlûm Ebdî û Serokê veguhêz ê Sûriyê Ehmed El Şeri de hate îmzekirin. QSD’ê bi helwesteke rast destê xwe ji bo çareseriyê dirêj dike. Lê hikumeta veguhêz ji ber di bin bandora dewleta Tirk de ye, nikare tu gavan bavêje. Ev çend carin hevdîtin têne kirin, heta niha di piratîkê de gavên şênber li ser erdê pêk nehatine. Di mijara Heleb, Dêrhafir û Bendava Tişrîn de komên girêdayî Tirkiyê û cihê xwe di nava Wezareta Parastinê de girtine, nahêlin xalên peymanan pêk werin. Ev destdirêjî barê hikûmeta veguhêz di hindir û derve de girantir dike.



# Aldar Xelîl: Sîstema navendî pevçûnên hundirîn diafirîne

**Endamê Desteya Hevserokatiya PYD’ê Aldar Xelîl tekez kir ku rêya gihaştina Sûriyeke demokratîk pêkanîna sîstema nenavendî ye û got, “Sîstema navendî dibe sedema jihevxistina hêzên civakî û afirandina pevçûnên hundirîn, ji ber wê jî pêwîstî bi hevgirtina gelên Sûriyê heye."**

**Lîloz Hisên/Hesekê**

Di giştî Sûriyê de niha rewşeke nezelal û tevlîhev heye ji ber negihaştina şêwazê hevpar ê ji bo birêvebirina Sûriya nû. Hikumeta veguhêz hîn jî li ser sîstema navendî ya bermahiya rêjîma kevin îsrar dike ku ev sîstem bûbû sedema sereke ya aloziya Sûriyê, li aliyekî din dengên piraniya Sûriyan banga sîstema nenavendî dike ku tê de mafên hemû pêkhateyan misoger dike û nimûneya wê jî projeya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Danûstendin di navebera Rêveberiya Xweser û hikumeta veguhêz de ji bo lihevkirina li ser şêwazekî hevbeş berdewam in û her diçe jî guhertinên cuda derdikevin holê.
Derbarê geşedanên dawî û rewşa ku li Sûriyê tê jiyîn, endamê Desteya Hevserokatiya Partiya Yekîtiya Demokrat, PYD’ê Aldar Xelîl ji Rojnameya me re axivî.

**‘Sîstema navendî nabe hevkar di pêşketina demokrasiyê de’**

Aldar Xelîl di destpêka axaftina xwe de bal kişand li ser sîstema navendî û encamên wê yên xerab li ser civakan û wiha anî ziman: “Sîstema navendî zordariyê xurt dike, lewma nabe hevkar ji bo pêşketina demokrasiyê. Sîstema navendî dibe sedema jihevxistina hêzên civakî ku pevçûnên hundirîn diafirîne, ji ber vê yekê rêya gihaştina Sûriyeke demokratîk pêkanîna sîstema nenavendî ye. Sîstema navendî şêwazeke ji sîstemên desthilatdar û zordar e, me şoreşek li dar xistin û qurbanî danî, divê encama vê şoreşê Sûriyeke demokratîk be, ne Sûriyeke zordar weke berê be.”

**‘Hikumeta veguhêz pabendiyê bi diyalogê nake’**

Xelîl destnîşan kir ku diyalog di navbera hikumeta Şamê ya veguhêz û Rêveberiya Xweser de berdewam in û wiha bedewam kir: “Pirsgirêk ew e ku hikumeta veguhêz pabendiyê bi van diyalogan nake û li ser tu lihevkirinan îmze nake, tenê bi gotinan dibjêje em qebûl dikin. Tu belgeyên fermî heta niha tune ye ku li ser îmez bê kirin, di vê çarçoveyê de em her dem daxwaz dikin ku her xalek lihevkirin li ser bê kirin divê îmze jî bê kirin û pebendî hebe ji bo dest bi pêkanînê bikin.”

**‘Îradeya Hikumeta veguhêz ne bi destê wê ye’**

Aldar Xelîl diyar kir ku îradeya hikumeta veguhêz ya Sûriyê ne bi destê wê ye û wiha got: “Dewleta Tirk gelek zextan li hikumeta veguhêz dike. Destwerdanên herêmî û navdewletî jî hene, bi taybet rola Tikriyê ku tê naskirin. Ji bilî hişmendiya nedemokratîk ya ku hikumeta veguhêz a Sûriyê pê tevdigere. Du şert hene divê bên pêkanîn ya yekemîn ew e pabendîbûna bi pernesîpên demokratîk, ya duyem divê dewletên ku destwerdanê di dosya Sûriyê de dikin bihêlin ku gelê wê karûbarên xwe bi rê ve bibin û pirsgirêkên xwe bi xwe çareser bikin.”

**‘Rêya çareserkirinê di destê gelê Sûriyê de ye’**

Aldar di gotinên xwe de behsa biryara 2254 kir û wiha domand: “Dema ku ev biryar hat girtin şert û merc cuda bû û rêjîma Baas hîn serdest bû, hêzên ku bang bi şoreşê dikirin hêzên cuda bûn û rastiya ku li herêmê jiyan dikir jî cuda bû. Pabendîbûna bi biryara 2254 dibe ku bibe hevkar ji bo pêşxistina çareseriyê. Di nerîna min de rêya herî baş a çareseriyê ew e ku gelê Sûriyê di navbera hev de bighêjin şêwazekî hevbeş li gorî şert û mercên ku tê re derbas dibin.”

**‘Ji bo avakirina Sûriyeke nû pêwistî bi hevgirtinê heye’**

Endamê Desteya Hevserokatiya Partiya Yekîtiya Demokrat PYD’ê Aldar Xelîl gotinên xwe wiha qedand: “Ji



bedêla ku em bêjin em ji sîstemên diktator xilas bibin ji bo birêvebirina Sûriyeke nû an jî avakirina komareke din, gerek di serî de li ser şêwazekî hevpar lihevkirin bê pêkanîn. Weke gelê Beravê, Siwêda, Humis, Hema, Cizîrê, Îdlib û hwd… hemû pêkhate nêrînên xwe îfade bikin di nava projeyeke demokrtîk û hevbeş de ku xwe bispêre li ser pernesîbên Neteweya Demokratîk an Rêveberiyên Xweser û nenavendiyê bi awayekî giştî, di wê demê de em dikarin bêjin em ji sîstemên zordar xelas bûn. Xelasbûna ji sîstemên zordar û diktator di serî de xilasbûna ji hişmendiyê ye, ne kesek an jî semboleke bi xwe. Herwiha çawaniya rêxistinbûna civakan û avabûna qenaeteke hevbeş li cem tevahiya gelên Sûriyê û di dawî de jî pêwistiyeke mezin bi hevgirtinê ji bo avakirina Sûriyeke nû heye.”

## Ruhê biratiya Kurd û Tirkan nayê parastin



**Zekî Bedran**

Ne diyar e ku danûstandinên di navbera HTŞ, QSD û Rêveberiya Xweser de ber bi kuve biçin. Ev ji nêrînên cuda yên girêdayi hişmendîya ku di navbera aliyan de derdixîne li holê. Wekî din, pirsgirêkên di navbera hêzên siyasî û civakî yên cûda de bi rêya lihevkirinê nayên çareserkirin. HTŞ’ê, QSD û hêzên cudahîxwaz wekî dijberî qaşo hêzên dabeşkerina Sûriyê dibîne. Hişmendiyekê wan a hişk, navendî û tûnd ya ji bona rêveberî û desthilatdariyê li ser bingeha ol û nijadperestiyê heye. Lê, Rêveberiya Xweser jixwe pergalek demokratîk ava kiriye. Di vê wateyê de, hişmendiya HTŞ û ramanên bingeha Rêveberiya Xweser ji hev pir dûr in. Bi rêya lihevkirina avakirina baweriya hevbeş, gengaz e ku ev cûdahîyên wisa werin çareserkirin û lihevkirinek çêbibe. Lê, pirsgirikên li Sûriyê, ne tenê li ser rêgezên navxweyî ne. Her wiha hêzên derveyî jî hene ku bandorek pir neyînî û tevlîhev dikin. Tirkiye di pêşengiya van hêzên derve de ye. Bi dijminatiya xwe ya bêaqil a li hember Kurdan, Tirkiye hemû destpêşxeriyan û pêvajoyan asteng dike. Ew polîtîkayan çêdike, zextê dike û gefan dixwe da ku Sûriyê kontrol bike û hebûn û destkeftiyên Kurdan ji holê rake. Li şûna ku dagirkeriya li Sûriyê bi dawî bike, li çareseriyek mayîndetir digere. Ew qelsî û pozîsyona HTŞ’ê bikar tîne da ku destpêşxeriyên çareseriyê têk bibe.
Wekî ku tê zanîn, QSD û koalisyona navnetewî li dijî DAIŞ’ê şerekî bi bandor û xurt dan meşandin. Di herî dawî de, serdestiya çeteyên DAIŞê ya li Bahozê li herêma Dêra Zorê hate bidawîkirin û DAIŞ hat têk birin. Gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê di vî şerî de zêdetirî 20 hezar şehîd û brîndar dan. Ev bûyer li ber çavên cîhanê hemûyan hatin jiyan kirin. Lê Wezîrê Derve yê Tirkiyê, mîna sixurekî şerê derûnî û taybet, bi berovajîkirina rastiyan amadekariya şer dike û wê rewa dide nîşan dan. “Divê QSD berya hertiştê hêzên xwe ji Dêra Zorê vekişîne, û divê herêm radestî HTŞ’ê were kirin.” Ew dibêje, “PKK hat û ew herêm dagir kir û bindest kir.” PKK kengî û bi kîjan hêzan hat û ew herêm dagir kir? Gelo ev hemû bi dizî, di şevekê de qewimîn? Ev nayê fêmkirin, lê gava niyet û hişmendî xera bibin, rastî tên bêwate kir in! Ew ji bîr nake ku bêje ger HSD ji wan herêman venekişe, dê şer û pevçûnên pir giran hebin. Kî û kîjan hêz dê vî şerê giran bike, kî dê sazûman bike? Gelên Sûriyê ji şer û êrîşan westiyaye. Pêwistîya wan şerekê nû nîn e. Ew li hevgirtin û yekîtiya Sûriyê digerin. Yên ku dibêjin ew hevalbend in, pewîste ew piştgiriyê bidin avakirina aştî û pergalek demokratîk. Lê Tirkiye amadekariya dûrûtina tewnekê nû dik e. PKK nemaye û têkoşîna çekdarî bi dawî kiriye, lê hikûmeta Tirkiyê, ku xwe li pişt hincetên weke PKK’ê vedişêre, hîn jî li dijî Kurdên Sûriyê jenosîd û qirkirinê plan dike.
Dibe ku were bîra we ku civîna yekem li Şamê, ku Thomas Barrack beşdar bû, ji ber Dêra Zorê hat xitimandin. Di civînên pey wan jî, mijara Dêra Zorê sereke ya rojevê de cîh girt. Dihat zanîn ku ev mijar ferzkirinek Tirkiyê bû. Bi awayekî dîtbarî,yên ku li ser maseya danûstandinan li dijî Rêveberiya Xweser hikûmeta demkî ya Sûriyê bû. Lê di rastiyê de, li ser maseya danûstandinan hişmendiya rayedarên Tirkiye bûn. Nûnerên Rêveberiya Xweser ji vê rastiyê ne bêxeber bûn. Niha, Wezîrê Derve yê Tirkiyê xwe eşkere dike. Ew ji çapemeniya şerê taybet re dibêje, “Gava yekem, ya sereke ew e ku QSD ji Dêra Zorê vekişe.” Çima Tirkiye ewqas tevlî danûstandinan û karûbarên navxweyî yên Sûriyê dib e? Hemû hewildanên wan armanc dikin ku gef li Kurdan bixwe û wan qir bikin. Ew teqez dikin ku ew ê di her şert û mercê de piştgiriyê bidin HTŞ’ê. Ew piştgiriyê didin HTŞ; hişmendiyekê wan a hevpar heye! Ev karê wan e. Lê divê em ji gelê Tirkiyê bipirsin; Çima HTŞ ji Kurdan zêdetir nêzîktirê we ye? Kîjan nirxên ku HTŞ diparêze û nûnertiya wê dike, li gorî rêgez û berjewendiyên we ne? Deskeftiyên ku ji hêla Kurdan ve têne parastin û li Sûriyê tê rêvebirin, wek demokrasî û hevgirtina bi gelên din re, ji bona we dûrtir in? Hûn dixwazin li Sûriyê çi rêveberî û cîran bibînin? Divê ev pirs her tim di rojeva gelê Tirkiyê de be û civaka Tirk ya demokrasîxwaz bê pirsîn. Niha, di hevdîtinên li Şamê de, entegrasyona QSD’ê derdikeve pêş. Ev jî ji ber zextên Tirkiyê ne. HTŞ balê dikişîne ser ewlehiyê. Ev rast e. Lê ew serweriyê tevahiya Sûriyê nakin. Li dijî Elewî û Durzîyan komkujî kirin. Ev hişmendiya wan e; ew pir paşverû ne. Ew çandeke xûlamtîyê ferz dikin. Ew ji demokrasiyê dûr in û li dijî wê ne. Lê ewlehî her tim bi komkujî û qedexeyan nayê bidestxistin. Herêmên Rêveberiya Xweser jî ne pariyeke nan e yê ku bi hêsanî tû daqurtîn e. Ew neçar in ku bi QSD’ê re danûstandinan bikin, her çend nexwazin jî. Wekî me got, entegrasyona hêzên çekdar ne rojevekî sereke bû. Lê wan israr kir. Rêveberiya Xweser ji bo ku pêvajo nexitime, hevdîtinan domand. Lê, mijarên cûda yên sereke hene. Pergala siyasî li Sûriyê dê çawa bimeşe? Bêyî lihevkirin û mejîyekê hevpar li ser vê yekê neyê nîqaşkirin, mijarên din bêwate dibin. Destûra demkî ya ku ji hêla HTŞ’ê ve hatiye amadekirin nayê pejirandin. Divê ev mijar weke rojevekî lezgîn bihatana nîqaşkirin û çareserkirin. Mîna ku hewlên wan yên li alozîya Sûriyê têrê nek e, wan pêvajoya li Tirkiyê jî asteng kirine. Ew zextê li Îmraliyê dikin, daxwaz dikin ku QSD tavilê çekên xwe deyne û tevlî çekdarên HTŞ’ê bib in. Ew dibêjin ku divê Îmraliyê jî bangek ji QSD’ê re jî bike. Ew difikirin ku Îmraliyê cihekê hêsan e ku ew dikarin Îmraliyê dîl bigirin û hişmendiya xwe ferz bikin. Ger Îmraliyê bangek wisa der barê QSD’ê de bike, ma ne divê ew bi rayedarên QSD’ê û Rêveberiya Xweser re bicive û li ser vê yekê nîqaş bike? Nêzîkatiyek ewqas paşverû û ji rêzê ji bo pirsgirêkek ku çarenûsa herêmê û gelê Kurd diyar dike dê çi derde re bibe derman?



## Masa Aştiyê

**Farûk Sakik**

ETA di sala 1958’an de ji bo serxwebûna herêma Baskê hate damezrandin. Piştî têkoşîneke demdirêj, di Cotmeha 2011’an de ragihand ku dev ji hemî çalakiyên çekdarî berdaye. Piştî pêvajoya muzekereyan a bi hikumeta Spanya re, di 3’yê Gulana 2018’an de fesixkirina xwe ragihand.
Josu Ternera, serokê rêxistina ETA bû. ETA ji bo serxwebûna herêma Baskê têdikoşiya. Serokê rêxistinê Ternera di axaftinek xwe de digot: “Ez naxwazim vî şerî ji zarokên xwe re mîras bihêlim.” Baş e heger şer wek mîrasek nedixwest ji zarokên xwe re bihêle, çimsa destpêkiribû?
Bi şerê Kurdan em bersiv bidin. Bawerim ew jî wek Kurdan heman qederê dijiyan.
Rêber Apo û hevalên xwe, di 15ê Tebaxa sala 1984an de dema ku şerê çekdarî da destpêkirin, dixwestin pêşî ji şerê ku wê zarokên wan di pêşerojê de bidin destpêkirin, bigirin. Şer kirin. Biserketin. Lê di sala 1993’an de bersiv nedan daxwaza dawî anîna li vî şerî. Di kuştin û xunê de israrkirin. Rêber Apo ji wê deme ve gelek cararan dîsa banga dawîanîna şer kir. Lê dîsa bêbersiv ma. Di 27’ê Sibata 2025’an de carek din wek Ternera got em vî şerî ji zarokên xwe re mîras nehêlin. Û pêvajoya ‘aştî û civaka demokratik’ da destpêkirin. Rêxistinê wî, bi kongreyek dawî li şer anî û xwe fesîx kir.
ETA jî di sala 2000’î de bi daxwiyaniyek got min dawî li têkoşîna şerê çekdarî anî. Di sala 2011’an de agirbestek mayinde da destpêkirin. Di sala 2018’an deklere kir ku hemû çeken xwe radest kirî û rêxistina xwe jî fesîx kiriye.
Hevdîtin di masayek çarkoşe de derbasdibûn. Li aliyek dewleta Spanya, li aliyek ETA, li aliyek hêzên navneteweyî yên navbekar û li aliyek jî zanaatkarên aştiyê hebûn. Li wê masê dîrokek hat nivîsandin.
Çêroka ETA, çêroka “rêxistinek teror” nebû; Çêroka bi trajedî ya têkoşîna wan, ji bo gelê ku nasnameya wî hatî înkarkirin, zimanê wî hatî qedexekirin, bû. Dema ku gele Bask bi travmaya kolektif a qedexekirin, asîmlasyonê dijiya, neçar mabû ev travma veguhêre şîddetê. Şer wisa destpêkiribû.
Li Tirkiyê jî Kurd heman tiravmayê dijiyan. Qedexekirina ziman, înkara nasnameyê û tundiya dewletê ne tene di hafızaya takekesî de, di heman demê di bîra-hafiza kolektîf de jî birin vekiribû. Û ji bo vê yeke ewroj (15’ê Tebaxê) şer dabûn destpêkirin.
Îroj ji bo ev birin werin dermankirin, bi tene çek danîn têrê nake. Dive, naskirina nasnameya Kurdî, bi terapîkirina bîrhafizayê û di qanûnan de mîsogerkirina mefê çandî pêkwere.
Lê dive maseyek çar koşe û li her aliye hêzek hebe. Di masa aştiyê de her çiqas dewlet û Ocalan hebin jî, Erdogan bi israr divê ev pêvajo ez bi sere xwe birêvebibim. Bahçelî jî li derveyî masê dihêle.
Berê Bahçelî bi hêz bû. Ji wî re hin “wahî” di hatin û wî jî tiştên jê dihatin xwestin, yek bi yek pêkdanî. Îroj bi tene diaxive, lê di pratîkê de hêzek ku midaxalê wî bike nemaye. Edî ji deverek din ji Erdogan re ‘wahî’ têne. Ji vê yekê cesaret digire û li gor berjewendîberdewamiya desthilatdariya xwe tevdigere. Ji çanda aştiyê pirr dûr e.
Ev yekan bûn sedem ku wek masaya çar koşeya muzekeriyên ETA û dewletê de, di muzakereyên bi PKK’ê di masa 2 alî de vala man.
Bi israr naxwazin hêzên navnetewî çavderiya pêvajoyê bikin. Di dewsa zanaatkarên aştiyê de meclise de komisyonek hatî avakirin. Lê mixabin destur nadin ev komisyon di masê de cîh bigire.